



## **Nameya Roja Şanoyê-Ewropa**

### **Simon McBurney, Mîrnişîna Yekbûyî(United Kingdom)**

Lîstikvan, nivîskar, derhêner û yek ji avakerên "Theatre de Comlicite"

Li Lîbyaya Bakur, nîv mîl dûrî peravên Cyrenaîkê stargeheke tehtan a bêhampa ye. Ev der bi pehnahiya 80 metreyî û dirêjahiya 20 metreyî ye. Zaravayê kuli wir tê bikaranîn "Hauh Fteah" e. Li gorî dahûrandinên karbonî ku di sala 1951'ê de hatin kirin xuya bû ku herêma ev nêzî 100.000 sal in ku bênavber wargeha mirovan e. Di nav bermahiyên ku li vir hatine dîtin de bilûreke hestî ku temenê wê di navbera 40.000 û 70.000 salî de ye jî hebû. Dema ez zarok bûm û min ev bihîst min ji bavê xwe pirsî:

"Qey mûzîkê çêdikirin?"

Bişîrî.

"Weke hemû komên mirovan".

Ew, dîroknasê pêşîn ê Amerîkî bû ku li Cyrenaica, li Hauh Fteahê lêkolîn kiribûn.

Îsal ez gelekî şanaz û kêfxweş im ku nûnerê Roja Şanoyê ya Cîhanî yê Ewropayê me.

Di sala 1963'yan de bapîrê min Arthur Miller dema ku her çar aliyên cîhanê di bin gefa şerê nukleerî de bû, gotibû: "Di heyameke ku dîplomasî û peşarî(siyaset) xwediyê milên gelekî kin û lawaz in de wextê bê xwestin ku hin tişt werin nivîsîn, hêza hunerê ya hestiyar û dikare xwe bigihêjîne cihên herî dûr divê ji bo barê hevgirtina civaka mirovan bikaribe bibe bersiv."

Gotina 'drama'yê di Yewnanî de ji peyva 'dran'ê tê ku wateya wê "..... kirin" e û her wiha peyva "şano(theater)"yê jî ji "theatron" tê ku di Yewnanî de wateya wê "cihê ku tê dîtin" e. Ne tenê cihê ku tê dîtin, di heman demê de cihê ku em dibînin, jê distînin û jê fêm dikin... Avanîsaz Polykleîtos beriya vê bi 2400 salî şanoya herî mezin a Epîdaûrûsê şayesand. Dengvedaniya(akûstîk) ev qada fireh ku 14.000 kes dikarin lê rûnên bêhempa ye. Li vê şanoyê, weke şanoyên din ên Yewnanî dema mirov li lîstikvanan dinêrê aliyê din ê dîmenê jî dibîne. Di heman demê de gelek cih, civak, şano û cîhana xwezayî dibûn yek; her wiha ev şano deman(wextan) jî dianî cem hevdu. Dema ku lîstik dikare niha destanên berê şiyar bike, dikare paşeroja me ya dawî jî li ser dikê bide xuyakirin.

Li Londonê dema "Shakspeare's Globe" ji nû ve hate saz kirin yek ji hayrazên(îlham) herî balkêş jî "kirina bi dîtinê re" bû. Ev hayraz bi roniyê ve têkîldar e. Li vir him dik him jî hol weke hevdu hatiye ronî kirin. Gel û hunermend dikarin hev bibînin. Her tim... Mirov li ku derê binêre mirov heye. Û Hamlet an jî Mahbet ne tenê *medîtasyonên* taybet in, her wiha nîqaşên gelêrî ne jî.

Em di demeke ku dîtin gelekî zehmet e de dijîn. Ji demên dîrokî û beriya dîrokî zêdetir em bi çîrokan hatine dorpêç kirin. Her "rastî" dikare neyê pejirandin, her "çîrok" dikare weke "rastiyê" were pejirandin. Bi taybetî jî ev pevbestî em dorpêç kirine. Hinek dixwazin me cuda bikin. Ji rastiyê biqetînin. Û ji hev biqetînin. Jixwe em cuda ne. Mirov ji mirovan... Jin ji zilaman... Xweza ji mirovan...

Lê ligel ku em di heyama veqetîn û parçebûnê de dijîn, em her wiha di serdema "tevgera mezin" de jî jiyan dikin. Mirov, ji her demên dîrokê zêdetir di nava tevgerê de ne; mirov hertim direve, dimeşe; heke pêwîst bike bi soberiyê, bi meşê koçberî cîhanê dibe. Û ev hêj destpêk e. Bertek jî -weke ku em hîn bûne- girtina sînoran bû. Avakirina dîwaran bû. Astengkirina desrbasbûnê bû. Tecrîdkirin bû. Xemsarî bûye yekeya diravî, em di pergaleke zordar a cîhanî de dijîn. Û ev zordarî ne tenê cihan, her wiha deman jî zeft kiriye. Em ji tiştên heyî direvin û dijîn. Lêhûrbûn li ser pêşeroj û paşeroja nêz e. Ez ne xwediyê vê yekê me. Ez ê vê bikirim.

Niha dema min ev yek kirî pêdiviya min bi tiştê din ên di rêzê de heye. Pêşoroja kûr winda bû. Niha paşerojeke bêdawî heye.

Gelek kes dibêjin ku şano nikare vê rastiye biguherîne, vê rastiye naguherîne. Lê wê şano lê nexe û neçe. Lewra şano ciheke ku ez dikarim jê re bêjim "stargeh" e. Şano, cihê kombûna mirovan, cihê avakirina komên mirovan e. Her şano komên mirovan in ku ji 50 giyanî(kesî) heta 14.000'î pêk tên. Ji karavaneke gerok heta ji sê parçeyan yekî yê Atenayê...

Û îro şano bi tenê hebûna xwe qaqibo bi ev dema berbat re dikişîne. 'Dema niha' hertim mijara şanoyê ye. Wate, di navbera hunermend û civakê de, di çalakiyeke civakî de hate avakirin. Ne tenê li vir, niha... Heke çalakiya hunermend tune bûya wê bîner bawer nekiriba. Bêyî baweriya bîneran wê pêşandan bi dawî nebûya. Em di heman demê de dikenin. Bi bandor dibin. Bêhna me diçike yan jî em bêdeng dibehitin. Û di wê kêliyê de em bi rastiya herî kûr dihisin. Parçebûna (fêrnekirinên) me di rastiye de sînorên hişmendiyan me yên takekesî ne. Ev tişt e ku em par ve dikin.

Ew nikarin me bisekinînin. Her şev em ê dîsa derkevin. Wê her şev hunermend û temaşevan dîsa werin gel hev. Û wê lîstika şanoyê(drama) ji nû ve were lîstin. Nivîskar John Berger dibêje "Di kûrahiya xwezaya şanoyê de hestê ayîneke vegeerê heye", ji lewra ye ku şano hertim bûye şêwazeke hunerê ya ku hejar hatiye hiştin. Ji ber ku cîhana me hatiye parçekirin êdî em hemû wiha ne. Çîrokên ku hunermend û temaşevan nikarin li tu deverên din bêjin wê li holên mezin ên operayê, li ser dikên şanoyê yên bajarên me yên mezin an jî li wargehên Lîbyaya Bakur ên penaberan û li hemû deverên cîhanê werin nîşandan. Em ê di vê nîşandanê de bi awayekî civakî hertim bi hev re bin.

Heke em li Epidaurosê bûna me yê li dîmeneke mezintir binêra û dîtiba ku em çawa par ve dikin. Em hertim parçeyeke ji xwezayê ne û weke ku em nikarin ji gerstêrka xwe birevin em nikarin ji vê yekê jî birevin. Heke em li Globê bûna me yê dîtiba ku pirsên ku di dirûvê de 'taybet' xuya dikin ji bo me hemûyan tên pirsîn. Û heke me bilûra Cyrenaîkayê ya 40.000 salî bigirta destê xwe me yê fêm bikira ku pêşeroj û îro jî hev

nayên qetandin û girêdana civaka mirovan ji hêla tîran û demogogan ve  
tu carî nayê parçekirin.

*\*Wergera ji Ingilîzî: Aram ALÎ*

Koma Şano/ Qamişlo